



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 5**

# Hêmanên Siyasî û Ayînî li Kurdistanê berî Zerdeştiyê

Ji bo her neteweyekê du hêmanên bingehîn hene ku hem di demên aştiyê û hem jî di demên şer da wê li ser hev dihêlin, û ji belavbûn û têkçûnê diparêzin. Yek ji wan **hêmana siyasî** ye; wek dewlet yan jî partî (rêxistin), û ya din jî **hêmana giyanî/çandî** ye; wek ayîn yan jî felsefe.

Di dîroka gelan da pir nîşan û belge hene ku girîngiya van herdu hêmanan ji bo aramî û pêşketina her neteweyekê diçespînin. Pir caran jî wisa bûye ku hêmana siyasî bi xwe ra û li gor xwe hêmaneka ayînî/çandî pêkaniye û afirandiye û hin caran jî bi vajayî wê. Gelo li Kurdistanê hêmana ayînî û siyasî berî peydabûna Zerdeştiyê di çi rewşê da bû?

## Pêwendiyên di navbera ayîn û siyasetê da li Kurdistanê:

### 1- Pêşketina Hişyariya Ayînî:

Destpêkên ramanên ayînî li ba gelan bi awayekî jînedarî (*anîmîzimî*) peydabûne. Yanê mirovan bawer kiriye ku giyan di her diyardeyeka suriştî da heye, û bandora xwe li jiyana mirov û jîneweran (heywanan) dike. Li hin deverên din jî li cîhanê bi awayê *Totemîzmî* peydabûye. Yanê li wan deveran mirovan bawer kiriye ku rahên wan yên êlî yan jî gelêrî vedigerin ser jînewerekî yan şîndarekê yan jî diyardeyeka suriştî ku ji wan ra bûye nîşana hebûn û parastina wan.

Di çarçewa van herdu baweriyan da perestina pût û latan peydabûye (wek perestina latekê yan jî darekê). Ev pût û lat yan

di kesmê (şiklê) mirovekî yan jî yê jînewerekî da ji kevir, dar yan jî ji maden çêkirine. Her weha perestina exter û stêrkan jî peydabûye û hemû şêweyên xwedawendan, çi mezin û çi biçûk[1].

Helbet, ne Kurd û ne jî gelên din yên Ariyanî, ne awarteyên vê qeydê ne. Gelek girînge ku em di vê babetê da pêwendiyeka kîp di navbera hişyariya ayînî û siyasî da bibînin û bidin xuyakirin. Me berê jî gotibû ku şêwaza here rast û durist ji bo têgihîştina mîtologî û ayînan ewe ku em ji rastiya civakî, çandî, sîyasî û aborî ya neteweyan destpêbikin ya ku di hundirê wan da ew bawerî peyadabûne, û di pey ra em derbasî xwedawendan û sazûmanên ayînî yên ku li dor wan çêbûne bibin; û ne bi vajayî wê.

Bi gotineka din: Sazûmanên ayînî wek pergal û tara çandî û giyanî ya sazûmanên siyasî ne. Pir nîşan û belgeyên dîrokî hene ji me ra diçespînin ku sedema peydabûna pir xwedawendan ew bûye ku li hember wan pir nawendên biryargirtina siyasî hebûne. Peydabûna *ayînên yekxwedayî* (yanê baweriya bi xwedayekî yekane) li gor peydabûna dewleta neteweyî/niştîmanî ya yekane bûye (wek nimûne: *Yehwayê Ibranî*). Pir caran jî dewleta neteweyî/niştîmanî bûye bingeh ji bo destpêkirina projeyeka berfirehkirineka gerdûnî ku ji asman da xwedayekî yekane (wek nimûne: Xweda li ba Krîstiyan û Misilmanan) û li ser erdê jî yan pêximberek, yan padîşahek û yan jî xelîfeyek rêberiya wê dike.

## 2-Peydabûna Hişyariya Yekxwedayî li Kurdistanê:

Di rastiyê da nûçe û agahdariyên ku bi baweriyên Ariyanî yên berî Zerdeştiyê va girêdayî ne pir kêmin. Ji lewra em nikarin wêneyekî hûrik û temam derbarê wan da peydabikin. Lê heger me ew agahdariyên hindik civandin û li pey hev rêzkirin (ji ber ku agahdariyên hûrik kêm û belavbûyî ne) û di pey ra me bi herikîna bûyerên siyasî gelemper yên gelên Ariyanî ra dan ber hev, emê di encamê da bigihînin destpêk û berbanga xwenasîna neteweyî/niştîmanî ya ku li ba gelên Ariyanî rojhilatî (ji Afganistan heya bi Kurdistan) peyadbûye.

Wê hîngê êl û hozan di navbera hev da hevpeyman li dardixistin, û dibûn wek yek hêz û wisa hişyariyeka siyasî ji bo

avakirina yek padîşahiyê ji wan gelan ra peydabû. Yanê ew kom û hevpeymanên êlî xwe wek endamên yek neteweyê didîtin.

Pêşketina vê hişyariya siyasî ber bi yekbûna neteweyê va bi xwe ra ol û ayîna *Ezdayî (Mezdeyî*) peydakir (li gor xwedawend *Mezda (Mihirdad)*. Xwedawend *Mezda* ne xwedayê gel yan jî êlekê bi tenê bû, lê belê ew xwedayê hemû mirov û tevaya cîhanê bû. Ev tê wê maneyê ku *Ezdayî* ayîneka yekxwedayî bû, bi xwedayekî yekane ji bo gerdûnê bawer dikir ku hemû gelên *Ariyanî-Rojhilatî* xwe di bin sîwana wî da didîtin.Bi gotineka din; *Ezdayî* pergal û tara çandî/giyanî bû ku hemû gelên *Ariyanî* di asta siyasî da gihîştibûn hev.

Ji bihurîna bûyerên dîrokî tê fêhmkirin ku *Madan* di dawiya sedsala 7-an ya b.z. da rêveberiya gelên *Ariyanî* di warê ayînî û siyasî da kiriye. Berî wê demê *Emperatoriya Aşûr* zora *Emperatoriya Mîtanî-Horî* biribû (ewa ku piraniya herêmên Kurdistana niha qada wê bû). Herweha *Padîşahiya Manai* ya rojhilatê Kurdistanê jî roxandibû, û her wisa jî li padîşahiya *Xaltî (Urartû)* ya bakurê Kurdistanê jî kiribû. Di heyamên dawî yên *Emperatoriya Aşûrî* da zordariya wê li ser hemû gelên çiyayî pir dirinde û giran bûbû.

Pêwîstiyeka lezgîn bi yekkirina hêzên pêşiyên Kurdan hebû ku di çarçewa termekî siyasî yekane da bicivin û bikaribin hemû hêz û şiyana neteweyê organîze bikin û têxin xizmeta berxwedana li dijî zordestiya *Emperatoriya Aşûrî*. Ayîna *Ezdayî(Mezdeyî)* (ku me li jor binavkir) şêwazê ayînî bû ji bo wê raman siyasî yekgirtî. Di bin sîwana vê ramana siyasî yekgirtî û ayîna *Ezdayî* yekgirtî da rêberê *Madan Deyako (Daiku*) (*Deyako* dora salên 675 yan 674 b.z. wexer kiriye) yekîtiya êlên *Madan* pekanî û kanîbû bi zanebûna xwe ya siyasî û pehlewaniya xwe ya rêbertiyê yekîtiya hemû êlên *Madan* ber bi pêş bixe, û wan ji tara (êl - dewlet, gund - dewlet) bigihîne tara (welat - dewlet, netewe - dewlet), û wisa *Padîşahiya Madan* avabike, ewa ku di her warekî da, çi rêvebirin, çi siyasî, çi çandî, çi leşkerî û aborî bû padîşahiyeka xurt û tund, û di pey ra agirê şoreşa rizgariyê li dijî *vegirtina Aşûrî* vêxist[2].

Belê raste ku *Padîşah Deyako* di şer da li dijî leşkerê Aşûrî bi ser neket; ew sala 715 yan jî 714 b.z.) hate dîlkirin û ew tevî malbata wî û civata padîşahiyê şarederî (surgunî) bajarê *Hemayê* li navenda Sûriyayê kirin. lê belê di pey ra neviyê wî *Keyxisro (Kai-Khosru)* (serdariya wî ji 625 - 585 b.z. ye) li ser şopa kalê xwe çûye, *Padîşahiya Madan* di warê rêveberî û leşkerî da xurttir kiriye, û wisa di sala 612-an b.z. da *Emperatoriya Aşûrî* roxandiye. Bi vî awayî *Padîşahiya Madan* bûye yek ji çar hêzên mezin yên Rojhilata Navîn yên wê demê (li tenişt *Padîşahiya Babil* ya *Kildanî* li Mezopotamiya, *Padîşahiya Lydiya* ya *Yûnanî* li Asiya Biçûk û *Padîşahiya Misirê*)[3].

Ya girîng ewe ku *Ezdayî* wê demê tara giyanî (ayînî/çandî) bû ku hevaltiya wan guhartinên di civaka Ariyanî bi giştî da kiribû. Têgihîştinên *Yekxwedayî Ezdayî* wek ayîne û neynika têgihînên yekgirtî yên ramanên siyasî *Ariyanî* bûn. Ev têgihîn di nivîsên Zerdeştiyê yên pîroz da (*Avêsta*) tên xuyakirin. Gelek balkêşe ku *Pêximber Zerdeşt* ayîneka nû peyda nekiriye, ew vegeriyaye ser kaniyên *Azdayiyê* û *Azdayî* wisa guhartiye ku bi rewşa nû ya civakên *Ariyanî* ra bigunce, wî *Azdayî* ji nîşan û xweriskên (adetên) pûtperestiyê paqij kiriye, ewên ku bi demê ra derbasî wê bûbûn. Niha jî hin nimûne:

- Dubarekirina navê "*Welatê Ariyan*" [4].

- Hatina têgihîna "*Welatên Ariyanî*"[5].

- Hatina navê "*Niştîmanê Ariyan*"[6].

- Hatina têgihîna "*Bereket ji Raboriya Ariyan*"[7].

- Hatina têgihîna "*Hosrava yê ku Gelên Ariyanî kirin yek Padîşahî*"[8].

*Di gotarên pêş da emê li ser hevaltiya ramana siyasî û ayînî li Kurdistanê berî dema Islametiyê binivîsînin.*

Jêder:

[1] Sigmund Freud: Totam und Tabus, rûpel 97, 100, 124, 125. André Lalande: Kana Laland ya Felsefeyî 1/71. M. Rosental: Kana Felsefeyê, rûpel 28. Kemîl Al-Hac: Kana

Asan di Ramana Felsefeyî û civakî da, rûpel 338. Imam Abdulfettah Imam: Ferhenga Ayîn û Efsaneyên Cîhanê: 3/333 - 334. Cemîl Selîba: Ferhenga Felsefeyî: rûpel 1/738.

[2] Herodotus: Dîroka Herodot, rûpel 77 - 80. Dyakonov: Mîdiya, rûpel 170, 171. William James Durant: Dîroka Şaristaniyê, 2/ 400.

[3] Dyakanov: Midiya, rûpel 257, 288, Harvey Porter, Kana Kurtahiya Dîroka Kevin, rûpel 68. Herodotus: Dîroka Herodot, rûpel 77.

[4] Avêsta, Yaşt 14, rûpel 574, 575.

[5] Avêsta, Yaşt, 13, ayet 43, rûpel 536, ayet 44, rûpel 537.

[6] Avêsta, Yaşt 8, ayet 60, 61, rûpel 460.

[7] Avêsta, Yaşt 18, ayet 7, rûpel 609.

[8] Avêsta, Yaşt 15, ayet 32, rûpel 52